STADT MÜNSTER

Amt für Schule und Weiterbildung

# Schulpsychologische Beratungsstelle

# Pirsgirêk di dibistanê de?
# Bi hev re çareseriyan bibînin



Kurdisch

## Di dibistanê de pirsgirêk?

Carcaran zarok û ciwan xwe di dibistanê de baş nabînin yan jî pirsgirêkên wan hene.

**Weke Mîsal:**

- Tirsên wan hene.
- Fêrbûn ji bo wan dijwar e.
- Ew nikarin xwe konsantre bikin yan jî dilê wan naxwaze.
- Pirsgirêkên wan bi hevalên xwe yên xwendekar yên keç,û yên xort re hene .
- Pirsgirêkên wan bi mamosta û mamoste re hene.
- Ew naxwazin êdî herin dibistanê.
- Li ser dersçêkirina li malê .astengî hene
- Ew dixwazin dibistana xwe biguharin.

Di van rewşan de û di rewşên wek van de „ciyê şêwirmendiya psîkolojîk ya dibistanê“ dikare alîkariyê bike.
Û li gel dijberiyên di navbera malbat û dibistanê de jî.





## Psîkologên Dibistanê çi dikin?

Li ciyê şêwirmendiya me, em tîmek ên ku ji qasî 20 pîsîkolgên dibistnaê yên jin û ji yên mêr pêk tê.

Em bi zarok, ciwan bi dê û bavên wan, bi mamosteyan û karmendin din yên dibistanê dixebitin ve dixebitin. Em wan agahdar dikin û alîkarya wan dikin, ji bo karibin pirsgirikan çareser bikin. Em vî karî di ciyê xwe yê şêwirmendiyê de û bi serdana me ya dibistanan de dikin.

Em bi çavekî ji der veji bo xwe dîtineke bêalî peyda dikin.Em guhdariya dîtinên cûr bu cûr yên beşdaran

dikin, em dixwazin wan fêm bikin û wan bînin ba hev. Em di navbera hemû aliyan de dîtina xwe ya bêalî diparêzin.

Armanc ev e, çalakkrina hêz û xurtkirina malbatê, ya dibistanê û ya zarok e.

Em bi hev re rêçekê dibînin, ku rewşa zarok yan jî ya xortî careke din baştir bibe.

### Em çi nakin?

Em nikarin li ser rista dibistanê biryaran bidin, weke nimûne li ser guhartina dibistanê yan jî ya sinifê yan jî li ser pêkanîna pwerdekirineke taybet.



# Nepenî, belaș û bidildarî

Em di bin erka sirveșartinê de ne. Bê destûra dê û bavan mafê me tuneye ku em agahiyan bidin yên dinan. Bi dibistanê re jî em dûra dikevin têkiliyê, eger mafdarên perwerdeyê ew qebûl kiribin.

Ev ji bo hevkariya bi dezgehê din, bi saziyan û dokto-ran û her wekî din re jî wisa derbas dibe.

Gorî tecrubeya me, ji bo çareserkirina pisrgirêkan ya bi herî bandor divê hemû beșdar werin cem hev.

Ji bo vê jî em pir caran hemûyan, yên ku bi zarok yan jî bi ciwanan re eleqa wan hene, ji bo civîna li dor maseya gilover dawet dikin. Em bi hev ra difikirin, ji bo alîkariyê yan jî ji bo pêșxistinê divê hîn çê dikare were kirin.

Șêwirmendiya me bê pere ye. Her kes dikare bi xwe biryarê bide, wê bi kar bîne yan na û heta çê wextê û çiqasî. wê bi kar bîne.

## Ne tirsin

Bandora șêwirmendiyê li ser mafê mayînê tu ne. Weke mîsal tesîra wê li ser doza mafê penaberiyê nabe.

## Bi zimanê we

Almaniya we ewqas ne baș e? Ev ne pirsgirêk e. Em yan jî dibistan bi dilxweșî ji bo axaftina șêwirmendiyê gazî tercumanekî dikin. Ev ji bo we belaș e û ji tercume kirina xwîșk û birayan ji baștir e.



# Em çawa dixebitin

Cara pêşîn em bi beşdaran re dipeyivin û  bi wan re li ser gavên wê werin avêtin li hev dikin.

Ji bo ku em karibin ji xwe re rewşê baştir fêm bikin,

- car caran em li dersdayinê dinêhirin,
- gorî îhtiyacê em testên psîkolojîyê bi kar tînin,
- em (bi hev re) bi dê û bavan, dersdaran, zarokan û ciwanan re dipeyivin.

## Em testê wisa çê dikin

Testên psîkolojiyê alîkariya me dikin,ku  zîrektî û dijwariyên zarokekê/zarokekî bizanibin. Bi gelemperî zarok di vî warî de bi tenê bi psîkologa jin yan ji yê mêr yê dibistanê re dixebite. Bi vî awayî bala wê/wî na reve. Ew dersên bîrê çê dike, dixwîne, dinivisîne yan jî hesabê matematîkê çê dike, dersên knobel yan jî bersîva pirsên li ser tirsan dide..

Tecruba me: Pir caran kêfa zarokan tê, dersan karibin çê bikin.

Em li ser encamê bi dê û bavan re dipeyivin û eger dê û bav qebûl bikin, bi mamosta û bi mamoste re jî dipeyivin. Bi hev re wê li ser tê fikirandin, wê çawa ji b o zarok yan jî jib o ciwan alîkarî were kirin.

Em hin tevdîrên ku alîkariyên dikin jî pêşniyar dikin. Bi vî awayî zorokek weke mîsal dikare ji pêşxistina fêrbûnê yan jî ji alîkariya terapiyê sûdê wer bigre.

# Bi me re biaxifin

Axaftina yekem dikare di nava demên li vê derê hatine diyarkirin de pêk were. Ji bo şêwiremdiyên din qeydkirin hewce ye.


**Schulpsychologische Beratungsstelle**
Klosterstraße 33, 48143 Münster
Tel. 02 51/4 92-40 81
schulpsy@stadt-muenster.de
www.schulpsychologie.muenster.de


## Demên axaftinê

| | |
|---|---|
| Duş – Car. | 9 – 12 und 14 – 16 Uhr |
| Pênc | 9 – 12 und 14 – 17 Uhr |
| În | 9 – 12 Uhr |

û gorî çêkirina Terminê

Di havîna 2018 de:
Duş. – în 8 – 16 Uhr





**Weşandina vê**
Weşanger: Stadt Münster ( Bajare Münster )
Desthilata fermî ji bo dibistanê perwerdeyê de zêdetir
Nivîsgeha Basin
Resiman: photocase.de (© 2Design), fotolia.com (© Christian Schwier, © Monkey Business, © tkyszk), shutterstock.com (© GaudiLab)
Adar (Mardi) 2018